

Çanda Kurdan li Mazin-
deranê û alîkarnebûna
dewletê

»»» R:7



Îran Zîndanek Bi
Dirêjahiya Temenê
Rejîma Îslamî

»»» R:3




*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (376) 21-06-2020 Buha (1000) Tûmen

Pîlanên rejîmê ji bo
sîxurî û çavdêrîkirina
civakê berdewam e!

»»» R:4



Zagona Qeyser
Û Pêşeroja Rejîma
El-Esed

»»» R:6



Rejîm bi tobparanê nayê parastin

Di rojên derbasbûyî de bo careke din Komara Îslamî a Îranê û dewleta Tirkîyê bi hevahengî û bi awayekî hevbeş êrîştî ser deverên sînorî yên di navbera Rojhilatê Kurdistanê û Başûrê Kurdistanê de kirin. Di wê êrîşa berfireh de wekî Fermandê Hêza Pêşmerge Kurdistanê ragihand: “Hêza Pêşmerge raştî ti ziyaneke canî nehatiye, lê jîngeha deverê bi rêjeyeke berçav ziyar lê ketiye”.

Gelek êşkere ye ku Komara Îslamî bi dirêjahiya salên derbasbûyî li hewla dagîrkirina Herêma Başûrê Kurdistanê ji rûyê hizrî û îdolojî û dîplomasiyê ve bûye, da ku bikare nifûza xwe bi ser wê deverê de zal bike; Ew jî ji rûyê êrîşa medyayî û şerê nerm ê rejîmê di wê herêmê de, bi tewahî diyar û berçav e, lê ji wê aliyê ve jî pêka deb û resma rejîmên koloniyalîstî ku bo lêdana armancên xwe mifahê ji hemû biyavên şerê nerm û zivir werdigrin, carna hewla têkdana aramî û asayîşa deverê daye, û ew mudaxile û sînorbezandin, û pêdirêjkirina xwe wekî karta givaşê di asta navçeyî û herêmî de

bi kar aniye; Lewma em dikarin bêjin hem topbarana wan çend rojan, hem jî lidarxistina zêdetirîn manora leşkerî di salên desrbasbûyî de, û hewldan bo milîtarîzekirina Rojhilatê Kurdistanê, di wê çarçêveyê de pênase bo tê kirin. Di vê derheqê de jî keysa Herêma Kurdistanê ji dîdgeha rejîma Îranê ve, keyseke ewlehî bûye û heye û zêdetir ji meşa pêwendiyê herî nizim a dîplomasi-bazirganî, di bazneya damezrawên ewlehî yên wekî, Spaha Quds û Şêvreyaya Bilind a Asayîşa Netewî û Dezgehên sîxurî de, digel Herêma Kurdistanê reftar kiriye. Bi vê yekê jî nesekinandiye, û em dibînin bi hêceta paraştina yekparçeyiya Îraqê û Sûriyê, bi merema rêgirtin ji her cure serketinek ya hereketa Kurd, hêzeke zêde ya Spaha Pasdaran aniye wan deveran û roj nîne ku laşê pasdarên li eniya şerê Sûriye û Îraqê venegerînin Îranê.

Cuda ji vê yekê jî, çavxişandineke lezgîn li ser rewşa perîşan a navxweyî a rejîmê, dikare xaneyek ji wê pazelê be ku, rejîm hewl dide sama xwe veşêre, siyaseta mijûlkirina

raya giştî bi pirsên cuda û hewldan bo bi encamgihandina siyaseteke hemû alî, siyaseteke nû ya rejîmê nine, û bi salan e ku, bi wê rêyê hewla firtûfêlîkirin li xelkê Îranê bi giştî û nemaze li netewên din yên deverê daye.

Komara Îslamî bi taybetî di wan salên dawiyê de, ji aliyê rewayî û baweriyê ve, raştî hin pîrsgirêkên micid hatiye, û hem di asta navxweyî û hem deverê de pêgeha xwe ya lawaz jî ji deşt daye, û niha ji bilî taqmen girêdayî xwe, ti welat û netewek piştevaniya wan nake, ne bi tenê piştevaniyê lê nakin, belkî bi berdewamî kiryarên wan yên têkder û alozker şermezar dikin.

Ji aliyekî din ve jî, rewşa perîşan ya aborî, civakî û birêveberiya rejîmê bi taybet piştî hatina nexweşiya Koronayê û kuştina xelkê nerazî yên mehên Xezelwer û Befranbar a sala 1398'an û xistina xwarê ya balafira Ukraynê wisa kiribû ku heta dem derbas dibû zêdetir rê bo nerizayetiya berfireh û hemû alî xweş dikir, herwekî ku me di wan çend rojên derbasbûyî de di çendîn cihên Îranê de dît, lê bi wan cure karan û hewldan bo afirandina şer û fitneyeke nû bi awayekî ku kontrolkirî be, hewlê dide ku hizra heyî ya aliyan biguhere.



Aliyekî din ya wê mijarê jî dikare “Rasana Rojhilat” be, ku karî wê rejîmê, ku bi salan bû piropagendeya jinavçûna Partiyên Rojhilat û xebata Kurd di Rojhilatê Kurdistanê de dikir, bêxe nav hewlên bê encam de, û binyata rizî ya deşthilata dîktatoriya wê bilerizîne, lewma wekî ku çavniherî dihate kirin, bi awayên herî hovane, bi girtinên bikom û heps û îdamkirinan, berbû canê xelkê Rojhilatê Kurdistanê.

Sergotar

Sama Rejîmekê

N: Kerîm Perwîzî

Sîstem koloniyalîstî ya hakim di Îranê de ketiye nav hewl-danên bêçine de, û ji bo mana xwe deşt bo her karekî dûr ji lojîk û pîrensîpên siyasî dibe.

Hekî sîstemeke siyasî û cî-hgirtî be, û ti xemekeke wê ya herifîn û ketinê tunebe, di hember arîşe û pîrsgirêkan de gelek giran û qahîm der-dikeve, û renga hindik caran li hember arîşe û pîrsgirêkan xweragir be, çimkî nîgeranê wê nîne, û seh bi metirsiyê nake. Lê hekî rejîmek şevane kabûsa herifînê bibîne, û bi roj jî nîgeranê sernixûniyê be, di demên asayî de jî, biryarên gelek neyasayî û dijelojîkî dide û arîşeyan ji xwe re dike krîz.

Vîrûsek hate nav welatê Îranê, û Xamineyî ji tîrsa herifîna rejîma xwe ev vîrûs veşart û piştî jî bû bi krîzeke mezin, ku rewaya rejîmê heta di nav besîc û wilayet-medaran de jî ji nav biriye. Her di vê derheqê de bû ku dema tîrsa mûşekên Amerîkayê ketibû dilê wan de, bilez balafireke Ukraynî kire armanc û kir krîzeke mezin ji xwe.

Di demekê de ku tev Îran di deştê Koronayê de dinale, û netewên Îranê rojane mirina ezîzên xwe dibînin ku Koronaya diyariya rejîma Îranê pêşîra wan girtiye, û wan azar dide, ew rejîme dubare pîrsgirêkan kûrtir dike. Spaha Pasdaran ku wekî bandeke terorîstî ya mafyayî ye, hemû welat talan kiriye, û ji tîrsa mirina rejîmê hawar xwe dibe ber topbaran û mûşekbarana Kurdistanê. Rojane li hemû bajarên Kurdistanê nûçeyên hereketa hêzên Spaha Pasdaran belav dibin û ji ber çavê xelkê hêz

PDKÎ êrîşên rejîma Îranê şermezar kir

PDKÎ daxwaz ji Hikûmeta Federal a Îraq û Herêma Kurdistanê kir ku di hember bînpêkirinên Spaha Pasdaran a terorîst de bê deng nemînin û helwîstê bigirin.

Deqa peyamê wihaye:

Daxuyaniya şermezarkirinê

Roja Sêşemî, 16`ê Hezîran a 2020`an, topxaneya hêza Spaha Pasdaran a dijî gel a Îranê, binke û bargehên Pêşmergeyên PDKÎ di çiyayê Qendîl û deverên sînorî yên deverên “Hacî Omeran, Çoman û Sîdekan”ê dane ber agirê giran yên topxane û katyûşayan. Di encama wê topbaranê de, xisarên giran bi welatîyên wan deveran ketine û malên wan kawil bûne û xelkekî zêde aware bûne.

Ew tawana rejîma Îranê yekem car nîne û berdewam bê hebûna ti hêcetekê mijûlê têkdana asayîşa xelkê deverê, awarekirina welatîyan û gi-handina xisarên malî û hundirî yên xelkê wan deveran e.

Em tevî şermezarkirina wê kiryara hêzên Komara Îslamî ya Îranê, daxwaz ji raya giştî û rêkxiravên mirovî dikin ku, wê kiryara dijemirovî ya rejîma Îranê şermezar bikin.

Herwisa em daxweaz ji



Hikûmeta Ferderal a Îraqê û Herêma Kurdistanê jî dikin ku, di hember wan bînpêkirinên Spaha Pasdaran a terorîst de ku bê hebûna ti hêcetekê, welatî û serwet û samanên wan kirine armanca topxaneyên xwe helwîstê bigirin û şermezar bikin û bê deng nemînin.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Dezgeha Pêwendiyên Giştî

28`ê Cozerdan a 1399`an

17`ê Hezîran a 2020`an

û cebilxaneyên Spaha Pasdaran in ku tîn û diçin û deverên çiyayên Kurdistanê dorpêç dikin. Her roj û ji aliyekî Kurdistanê ve, nûçe tîn ku hêzên Spaha Pasdaran yan xelkê asayî digrin yan jî azar û îşkence dikin, yan jî topbaran û mûşekbarana Kurdistanê dikin.

Di gelek cihan de Spaha Pasdaran hêzên xwe damezrandîye û gefan li xelkê deverê dixwe, ku hatûçûya çiyayan nekin, û ji gundên xwe dûr nekevin. Her di vê derheqê de, gefeke zêde li xelkê xwarine ku her hereketeke pêşmergeyan bibînin, bila raporê bidine Spaha Pasdaran. Kûrbûna krîzên siyasî yên rejîmê û herifîna aboriya Îranê û tundtîrbûna givaşan, wiha rejîm tirsandîye, ku hemû dol û bin kevîrên Kurdistanê jî ber çavên wê bûne pêgeha hêza pêşmerge, û kirêgirtiyên wê her Kurdekî bibînin, wisa dizanin ku ew pêşmerge ne, û hêzeke zêde ya Spaha Pasdaran li dijî wan amade dike.

Di demekê de ku hemû cihan Komara Îslamî bi metirsî bo ser cihan û deverê dinasin û di mînaka herî nû de, rapora Îtîla`ata Alman, Hizbullah û Îran bi gefeke micid bo ser ewlehiya deverê daye zanîn, Spaha Pasdaran ji tîrs û ziravqetandinê de çend roj li pey yek e ku Herêma Kurdistanê Îraqê topbaran û mûşekbaran dike!

Hemû ew kiryar û helwestên rejîmê, nîşaneyên bihêziya wê sîstema koloniyalîstî nînin, belkî derxistina wê raştiyê ye, ku di bin givaşên bêreje de, tîrsa herifînê, serûbinê rejîmê dagirtiye, lewma hemû kiryareke nalojîkî û nasiyasî, û hemû cure hewldanekê bo berdewamiya mana xwe dike, û di vê derheqê de jî, roj li pey rojê, di bin givaşan de şaşiyan zêdetir û zêdetir dike, û krîzên wê jî kûrtir dibin.

Îran Zîndanek Bi Dirêjahiya Temenê Rejîma Îslamî



N: Serbest Urmîye

Ne pir hêsan e ku meriv di sîstemeke weke Komara Îslamî ya Îranê de li dor zîndan û zîndaniyan zimanê gotinê veke. Jiber ku ast û aliyên hovîtî û tawanên li dijî mirovahiyê ew qas di zîndanên rejîma Îslamî de zêde û berfireh in ku hiş û hedamên meriv aloz dikin. Meriv nikare çi yan kîjan aliyê jiyana zîndaniyan bas bike ku rengeke tewaw ji hovîtiya rejîmê li ser jiyan û kesayetiyê zîndaniyan eşkere bike. Serbarê vê hinde jî ku hertim ji aliyê civaka navneteweyî û rêkxistina Dewletên Yekrîtî ve seba bînpêkirina mafên mirov û hovîtiya li dijî dijberên rejîmê nemaze di zîndanên de hatiye mehkûmkirin, lê meriv nikare aliyeke jiyana zîndaniyan bas bike ku destê tawana rejîma Îranê tê de çinebe. Ne tenê kesên zîndanî di zîndanên rejîma Îranê de, belkî malbatên wan jî hertim ber bi rûyê gef û eşkenceyên zîndanvan û navendên ewlekariyê yên rejîmê dibin.

YASAYA EŞKENCEKIRINÊ DI ÎRANÊ DE

Serbarê vê hindê ku eslên 38 û 39'an yên destûra binge-hîn a rejîmê bi eşkere li dijî eşkence û şikandina kesayetiyê girtî û zîndaniyan disekine, lê dezgehên ewlekarî û navendên sîxurî yên di Komara Îslamî de ji eşkencê weke alavê bivêc û dilxwazê xwe, ji bo wergirtina îfadeyan ji girtî û bi taybetî zîndaniyên siyasî mifahê werdigirin. Ji bilî destûra binge-hîn a rejîma Îranê, civata giştî ya rêkxistina Dewletên Yekgirtî, di sala 1984'an de, di daxuyaniyeke giştî de yasaya ji holê rakirina eşkence û hemû cure

kiriyarên hov li dijî girtiyan ragihand û hemû dewlet erkdar kirin ku vê yasayê wajo bikin. Lê heya niha jî rejîma Îranê bi fermî ev yasa pesend nekiriye. Ev jî meriv dikare bêje ku ji ber du meremên serekî ye ku rejîm tevî vê yasayê nabe. Ya yekem eva ye ku di yasaya cezayên Îslamî ya Îranê de lêdana qemçuyan, birîna dest û tiliyan, kevirbarankirin û ...hwd, ku mînakên bilind ên hovîtiyê ne li dijî mirovahiyê, bi fermî hatine naskirin û weke ceza hatine destnîşankirin. Ya duyê jî eva ye ku sîstema dadweriyê di Îranê de ji bo selimandina tawanê, tekezê li ser îfade û îtrafê dike ku di vê derheqê de jî eşkencê rêyeke herî hêsan e.

REJÎMA ÎRANÊ Û HEWLA ALOZKIRINA DERÛNÎ YA DIJBERÊN SIYAYÎ

Şerê derûnî yek ji bihêztirîn û di heman demê de jî metisîdartinê şeran e ku heya niha hatiye nasandin. Şerê han bi astekê ku bihêz e, bi heman astê jî metisîdar e, jiber ku hertim hizir, bîr û bawer û hişên meriv dike armanc, heya ku bikare îradeya meriv bişkîne û merivkî bê îrade û bi kesayetiyek lawaz berhem bîne û teslîmê îradeya xwe bike. Bi terzekê ku marşal "Erwin Johannes Eugen Rommel", yek ji fermaddeyên leşkirî yê Almaniyayî dibêjê: "Fermaddeyê bihêz ev e ku bikare berî laşê neyarê xwe bi ser hizir û ramanê wî de zal be". Pêvajoya alozkirina derûnî ya dijberên siyasî li gor gelek çavkaniyan çend salan berî hiloşiyana



Yekîtiya Soviyetê, ji aliyê dezgehên sîxurî û ewlekariya wê yekîtiyê ve eşkere bû. Pevajoya han pitir ji sê dehsalan di Soviyetê de hebûye û ji bilî dezgehê sîxurî û ewlekariyê ya bi navê "KGB", komelek ji bijîşk û pisporên derûnnasî jî di bin emrê "KGB"ê de ev pêvajoye meşandine. Herçend ku piştî hiloşiyana Soviyetê ev pêvajo bo heyamekê bi dawî hat, lê li gor hin çavkaniyan dîsan di Rûsiyê de heman pêvajo heye û di heman demê de ji aliyê dewleta Çînê ve jî pevajoyek hevşêwe dimeşe.

Rejîma Îranê jî aliyê kêr ji du dehsalan berî niha ve, ev pêvajo dest pê kiriye û aliyê kêr di wan du salên bihorî de bi awayeke berfireh ji bo ku him malbat û him jî civaka derdor ji tevgera rizgarîxaziyê û dijberiya rejîmê bêhevî û dûr bixe, li ser zîndaniyên siyasî ev pêvajo xurt kiriye. Rejîm ji bilî cezadana zîndaniyên siyasî, bi xasma yên ku bi îdamê mehkûm kirine, malbatên wan jî ji aliyê derûnî ve eşkence dike. Di vê derheqê de navendên ewlekariya rejîmê bi ser dezgehên dadweriyê de zal in û hertim hewil didin ku malbatên girtiyan di rewşeke derûnî ya aloz de ragirin û hewil didin ku her carê bi terzekê agahiyên nerast û bi êş û jan bidin malbatên girtiyan. Ji aliyeke din ve çi agahî ne ji term û ne jî ji cihê veşartina termê girtiyên îdamkirî, nemaze endamên aliyên siyasî yên dijberî rejîmê, ji malbatên wan re nahên dayîn û hertim gef ji malbatên wan tên kirin ku nabe çi daxuyaniyan bidin yan hevdiñinan li dor îdamkirina endamê malbata xwe bi çi ragihandinan re pêk bînin. Herwiha çi awayî rê nahê dan ku heya li gor urf û baweriyên civakî re û resmên serxweşiyê jî werin danîn. Ewa di demkê de ye ku rejîm bi heman terzî hewil dide ku bi dana zaniyariyên ne rast li dor malbatên girtiyan û neçarkirina wan di bin eşkenyeyan de bi îtrafkirinê û encamdana hin Karên sivik, rewşa derûnî ya girtiyan jî aloz bike û bi şikandina kesayetiyê wan, wan teslîmê îrade û xwestekên xwe bike. Bi terzekê ku heke li zîndanê werin serbest berdan jî, bandora nerênî ya zîndan û girtîgehên rejîmê hertim bi ser hizra wan de zal be.

Pîlanên rejîmê ji bo sîxurî û çavdêrîkirina civakê berdewam e!



N: Dara Natiq

Siyaset û ştratêjiya rejîma bi nav Komara Îslamî ya Îranê li ser bingeha şerxwazî, dagîrkari, pawanxwazî û hinartina bi gotina xwe a şoreşa Îslamî bo derveyî welêt hatiye avakirin û di asta hundirî welêt de jî li ser bingeha fetisandin, tepeserî, girtin û îdam û eşkenckirin, herwisan bêdeng kirin û jinavbirina her cure dengê azadîxwazî û cuda bîriyê tê meşandin.


Kompiloyên rejîmê û damû-dezgehên ewlehî û tepeserkar yên wê ji bo kontirolkirina civakê û fetisandina dengê azadî û bîr û hizrên cuda di pêxema helandina civatgeha giştî a Îranê di nava felsefeya tarî û kevneparêz a “wilayeta feqîh” de didome û roj li pey rojê gelên belengaz û mafxwarî yên welêt di nava tengasî û maşîna fetisandin û bîr û hizrên kevneşop û dîktator yê rejîma Xomeynî û hewhîzrên wî de tî tepeserkirin û mafê wan tî bînpêkirin û jiyan ji wan tê talkirin.

Di pîlana nû a hêza tepeserkar û terorîst a Spaha Pasdaran de rejîm bi belavkirin û dana sîmkarta telefonê ya şirketa “Îransêl” bi awayek mecanî û bê pere di nava xelkê kurdiştanê de, hewil dide ku tora xwe ya sîxuriyê berfirehtir bike û tev pêwendî û tîkiliyên xelkê kurdiştanê bixe bin çavdêriyek zêdetir a dezgehên emniyetî yên xwe û bi wî awayî xelkê zêdetir bikêşîne nava dezgehên xwe yên sîxurî û ewlehiyê.

Herwek ji tev aliyekî re eşkere ye ku tev kompanî û alavên weke tora telefon û internetê di bin deştê Spaha

Pasdaran û damûdezgehên wan yên emniyetî de ye û ji wê rêkê ve rêjîm hertim hewla kontirolkirin û sîxurîkirin bi ser pêwendî û liv û tevgerên rojane yê xelkê dide.

Rejîm pêştir jî ev sîmkartên telfonê ji rêya zankoyan û kesên kirêgirtî yên xwe ve di nava xwandekar de bê pere û bi belaş belav dikirin heya ku bikarin liv û pêwendiyên nîfşa xwandekar zêdetir bixin bin çavdêriya xwe. Di vê daviyê de jî û bi taybetî li bajar û gundên Kurdiştanê û ji rêya deşt û pêwendiyên xwe ve sîmkart û heta amêrên telefonan jî nemaze li gundan didin xelkê wan deweran bi merema sîxurîkirin û wergirtina zaniyariyan. Armanca rejîmê ji vî karî xizmetkirin bi xelkê nine û belkî ew dixwazin ku ji vê rêkê ve zêdetir xelkê Îranê bi giştî û bi taybetî xelkê Kurdiştanê bixin bin berçavkîna xwe yên emniyetî û hizr û azadiya xelkê bi tewahî ji wan biştînin û civakê zêdetir bifetisînin.



Zêdeyî çil salan e ku rejîma mirovkuj û dîktator a Îranê bi rêya zorê û tepeserkirina civatgehê, deşhilata zordarî û dagîrkariya xwe bi ser gelên belengaz yên vî welatî de sepandiye. Li encama siyasetên şaş û dujminkarane yên rejîmê û herwisan îdare û modîriyetkirina xelet a rayedarên rejîmê di warê dewletdarî de, aboriya welêt bi tewahî hatiye herifandin. Rêjeya bêkarî, hejarî, giranî, nebûna delîveyên karî, roj bi roj zêdetir dibe. bi dehan diyardeyên weke, xwekujî, telaq, îtiyad, dizî, her roj zêdetir dibe. Civakek mandî û veştîyayî û evdalê siyasetên şerxwazane û pawanxwazî ya wê rejîmê, êdî ti hêviyek wan bi jiyan û paşerojek aram û geş re nine. Rejîmê êdî bi tewahî rewaya xwe ji deşt daye. Welat bi tewahî bi krîzek aborî, siyasî û civakî re rû bi rû bûye. Îran bi tewahî di asta herêmî û derveyî de ketiye perawêzê. dorpêçên aborî û siyasî bo ser Îranê ji aliyê civatgeha navneteweyî û bi taybetî Amrîkayê ve berdewam e. Rejîmê êdî şiyana çareserkirina wan arîşe û girêpêçkan niye û deştêpêka herifîn û jinavçûna vê deştê pê kiriye. Civak bi tewahî ji nîzamê bêzar bûye û dengê azadîxwazî û mafxwazî her roj bilind dibe. Di wan salên derbasbûyî de serhildan û nerazîbûna xelkê bi tewahî tirs û xofek mezin xistiye nava dilê koşka zordariya rejîmê û xewa şevê ji wan heram bûye. Levama rejîmê bîna gurê har û bîrsî û ji tirsê serhildana seranserî ya xelkê Îranê deşt avêtiye her cure alav û pîlanekê ji bo kontirolkirin û çavdêrîkirina zêdetir bi ser xelkê de. Pêvajoya tepeser kirin û çavdêrî kirin bi ser liv û tevgera rojane a xelkê Bi taybetî li Kurdiştanê berdewam e. Her cure dengê azadîxwazî û mafxwaziyê bi awayek tun û hovane tî fetisandin û bi dîr ji her pirinsîbekî exlaqî û mirovî meş û kom civînên nerazîbûna xelkê tî tepeser kirin.

Rayeleyên înternetî û telfonî ku di bin modîriyet û deşhilata Spaha pasdaran de ne zêdetir ji bo kontirolkirina civakê tî bikar anîn û li cihê vê yekê ku li xizmeta pêşketina civakê û daxwazên xelkê de bin ji bo çavdêrîkirin bi ser pêwendiyên wan weke sîxurek tî bikaranîn. Lewma hewceye ku gelên Îranê bi giştî û xelê mafxwaz yên kurdiştanê bi taybetî hişyarî wan pîlan û koployên rejîmê bin û nekevîne delîka rejîma kevneparêz û dîktator a Îranê.

Komara Îslamî û Paşveçûna Domdar



N: Elî Munezemî

Ji mēj ve ye mirov li wê rastiye hesiyane ku hêştā xêncî erdê çî topên esmanî ên din peyda nebûne ku mirov bikaribe li ser bijîn û li ber wê yekê jî dibe heya destê wan tē, pêdiviye ku wê topa esmanî biparêzin heta ku jiyan bikaribe li ser wê dom bike. Di sala 1987'an de komisiyonek cîhanî bo wê armancê pêk hat û bo yekemîn car li rapora wan ya di bin navê «pêşeroja me ya hevpar» de amaje bi peyva «pêşveçûna domdar» hate kirin.

Pêşveçûna domdar bas li pêşveçûnekê dike ku hewcedariyên îro bicîh bîne bêtî ku derfetên nîfşên pêşerojê ji bo ku hewcedariyên wan bicîh bîn, hilweşîne.

Di vê destnîşankirinê de, giringiyek taybetî li ser hewcedariyên qatên hejar ên ji bo bideştîstina mafên wan yên bingeîn û afirandina derfetan ji bo jiyanek çêtir ji bo wan hatibû dan. Di heman demê de, pêşveçûna domdar tekez dike ku dibe sînorek hebe bo bikaranîna wan tiştên îro xweza dikare bide me bêtî ku li ser hesaba wan tiştan be ku di pêşerojê de mirov dikin jê bi dest ve bînin.

Pêşveçûna domdar ku ramanek cîhanî ye, xêncî berçavgirtina jiyana nîfşa niha, bo destekdan û piştgiriya nîfşên pêşerojê di sê rehendê mercên civakî, aborî û paraştina xweza û meseleyên pêwendîdar bi rewşa guherîna seqayê de erkên hevpar dixe ser milê rûniştîyên topa erdê. Jiber ku serçaveyên xwezayî yên

li wê topa esmanî dikarin bi dest ve bîn sinordar in û li paraştina wê topê di qazanc û berjewendiya hemû aliyekê de ye. Jiber wê hindê rêkxistina neteweyên yekgirtî pîlan û armanca xwe ya heta sala 2030'an bo nehêlana hejariyê, cehd û têkoşan bo naberamberiyê û sekinandina guherîna seqayê destnîşan kirin. Jiyan di hejarî û belengaziyê de dibe sedemê hindê ku mirov maf û nirxên xwe ji dest dide û herwisa nehêlana hejarî û kêmkirina mewdaya naberamberiyê dibe sebebê seqamgîrî û aştiyê di civakê de û di navbera welatan de. Bilindbûna asta naberamberiyê di navbera welatan de dibe sedemê derkevtina nakokî, alozî û şer û ew yeka jî bi hemû şikelê bi zirara xweza û şûrûştê ye û dibe astengî li ser rêka pêşveçûnê.

Komara Îslamî a Îranê di heyamê pitir li çar dehikan e li deştîlatdariya xwe li Îranê de û domandina siyaseta xwe ya dagîrkari di Rojhelatê welatê me de, berevajî hemû wan pîlan û armancên rêkxistina neteweyên yekgirtî pêngav hilaniye. Ew nêrîna me li gor heger û argûmentên abjiktîv e û bo selimandina wê rastiye em dikarin amaje bi wan xalan bikin:

- Komara Îslamî a Îranê ku rolek xirab di navçeya Rojhelata Navîn û cîhanê de dilîze, bûye sedemê bilindkirin û aloziyên zêdetir di navbera girûp û neteweyên rikeber û şer û pêkdadanên zêdetir. Şerê Îranê li dijî neteweya kurd di hemû parçeyên Kurdistanê de bi giştî û di Rojhelatê Kurdistanê de bi xasmanî, şerê Îran û Îraqê, rola Îranê di şer û aloziyên navbera ereban û Îsraîlê, şer û nakokiyên di Sûriye, Yemen û şer û nakokiyên Balkan û ... hwd hindek mîna-kin li wan kar û kiriyarên karbideştên rejîmê ne ku bûne sedemê têkdana jîngeh, bilindbûna asta hejarî û naberamberiyê di wan welatan de.
- Bilindbûna asta nîfûsê di Îranê de û nebûna pîlan û

bernameyan bo afirandina derfetan bo kar, bûye sedemê bikaranîna zêdetir a kanga û serçaveyên xwezayî yên ser erd û bin erdê di Îranê de û xisar gihîştandin bi xwezayê.

- Binpêkirin û nehêlana mafê mirovî yê xelkê û nebûna wekhevî û siyasatên dijî neteweyan, jinan û nebûna derfet û îmkânên beramber bo xwendin û kar û zaf naberamberiyên din derfet û îmkân ji xelkê re nehêlîne ku bi şeweyek erênî kartêkeriya xelkê di ser civaka ku tede dijîn, hebe. Herwisa ew kesên ku derfeta wan ya xwendinê jî heye û li wan îmkânatan mifahê werdigrin, li welat re nabin mal û piştî qetandina xwendinê koçber dibin û li welat direvin.

- Eger çî guherîna seqayê di wan salên dûmahiyê de zêdetir bûye, lê siyasatên şaş yên rejîmê jî bi hemû awayekê rewşa xwezayê di Îranê û Rojhelatê Kurdistanê ya di aliyê Îranê ve hatî dagîrkirin, têk dide. Îranê bi çekirina bendavan di ser rûbarên Kurdistanê, rolek mezin hebûye li ser hişîkbûna Gola Urmiye û têkçûna rewşa xwezayê di zaf navçeyên Rojhelat û Başûrê welatê kurdan de.

- Şewitandin û agirtêberdana dariştanên Kurdistanê yekek din li pîlanê rejîmê ye bo têkdana jiyana kurdistanîyan û xwezaya Kurdistanê. Ew ne tenê li dema agirpêketina dariştanan li Rojhelatê Kurdistanê de çî cehd û livekê bo temirandina wî agirî nakin, belkû xelk karbideştên rejîmê bi tometbarê sereke dizanin ku bi qeştî û zanabûn agir berdidin dariştanan.

Ew xalane û zaf heger û argûmentên din bi eşkere wê rastiye dixin berçavan ku siyaseta rejîmê berevajî armanca rêkxistina neteweyên yekgirtî bo «pêşveçûna domdar» e û zêdetir wek siyaseta «paşveçûna domdar» xuya dike. Pêdivî ye ku sazî û rêkxistinên jîngehparêz û parêzvanê mafê mirovan û berevankarên mafê gelan û hemû ew azadîxwazên ku dilê wan bo deşteberkirina jiyana birûmet bo mirovan lê dide, wê siya-



seta rejîmê şermezar bikin û tevî hêz û hereketên aşîxwaz, wekhevîxwaz û dadperwer bibin hevpêngav û hevxeber ku bi hîloşandina wê rejîmê xweza û mirovanetî rûyê asûdeyî û aramiyê bibînin û hemû neteweyên cîhanê li armanca xwe ya 2030'an, anku «pêşveçûna domdar», nêzîk û nêzîktir bibin.

Zagona Qeyser û Pêşeroja Rejîma El-Esed



Mihemed Hesko

Xweşbextane ye ku piştî neh salan ji bo belat û kuştara Sûriyayê sizaya Zagona Qeyser ya ji bo (paraştina sivîlan) li Sûriyayê, wê bikeve warê bicihkirinê, tevî ku azadîxwaz û dijberên rejîma Sûriyayê derkirina vê zagonê bi serkeftineke stratîjîk di pêvajoya xebata hilweşandina rejîma Be'is de didin zanîn û bi pêngava yekem an bi deştpêka bidawîanîna rejîma Serokomarê Sûriyê Beşar El-Esed yê dîktator dibînin, lê wê yekê jî li ber çavan digrin û baş dizanin ku, wê bandoreke nerînî li ser jiyana welatiyan di hemû waran de bike!?

Yasaya Qeyserê ku bi girtina 55 hezar wêneyên 11 hezar zîndaniyên ku di bin îşkenceyê de bi awayên hovane canê xwe ji deşt dane, daxwaz kir ku rejîma El-Esed were riswa û şermezarkirin, û raştiya hovane ya rewîsta xwînîna ya vê rejîmê ji civaka navdewletî re were aşkere kirin, her wiha ev wêne bûn belge da ku dewletên zilhêz nikaribin çavên xwe bigrin, û biqîrîn û bi hawara gelekî setembar de werin, ev rejîma bû sedema koçberbûna 14 milyon welatî û kuştina bêhtir ji 60 hezar zêndanî, her wiha rejîmê digel hevalbendên xwe (Rûsiya, Îran û Hizbullah) bêhtir ji milyonek kes bi rêya barandîna bermîlên bombekirî, çekên kîmawî û mûşekên dûravêj kuştin e, û ev kuştar li pêşberî civaka navdewletî dihat kirin, mixabin hemûyan piştî xwe dabû bobelata gelê rebenê Sûriya û ew paşguh xistibûn.

Erê Zagona Qeyser ya Amerîkî şûrê du devî ye, devekî wê li ser stûyê serokomarê setemkar û dîktator Beşar El-Esed û karbideştên dewleta Sûrî be, û ji bo fişarxistin bi ser rejîmê de daku vegere masa gotûbêjan digel dijberiya Sûrî, û devê din jî wê li ser stûyê gel be, û wê nanbirê xelkê hejar û perîşan be, û wê ji gel re ne tenê bar be, lê belê wê serbar jî be. Jiber ku di dîroka sepandina sizayên aborî bi ser rejîmê dîktator de mînak, Sedam Husên, Îranê û Kobayê, her û her gel bac dida û rewşa welatiyan kambaxtir dibû. Lewira divê girîngeyek taybet bidin jiyana welatiyên Sûrî û pêdiviyên wan werin dabînkirin.

Bi spandina sizaya Zagona Qeyser re, çend pirsyar dikevin rojevê. Gelo rejîm wê bendên zagonê yê derbarê vergera welatiyan bo werên xwe, bêtir ku lêpîrsîn digel wan were kirin, û qedexekirina bombebarankirina sivîlan û serbestî berdana hemû girtiyan û rakirina dorpêçê ji ser deverên dorpêçkirî û lêpîrsîn û dadgehkirina tawankarên ku tawanên cengê encam dane, û rêpêdan bi derbasbûna alîkariyên mirovî bo deverên kambax û rêpêdana rêxistinên navdewletî bo seredankirina girtîgehan û deştpêkirin bi gotûbêjan digel dijberiya Sûrî.



Ev e eger rejîm pêbend nebe bi van bendan, ma gelo ev yek, ne rûbirûbûneke bi Amerîka re? Gelo wê karvedanên Amerîka çi bin? Her wiha hevalbendên Beşar El-Esed wê karbin vî barî hilgirin, ji ber ku aboriya rejîmê kambax e, û bi milyardan Dolaran dendarê Rûsiya û Îranê ye. Niha rojên reş ên rejîmê deşt pê kirin û di pêşerojêke nêzîk de, wê rûreşî û hêza xweragirtinê wê diyar bibin, her wiha kar û karvedanên herdu aliyan wê bersivên raştînî bin.

Mixabin...hemû dîktator dildarên pare û deşthilatê ne, dîktor in û bê bihayên mirovatiyê ne, jiyana gel û hebûna welat dikin qurbana xwezî û arezûyên xwe, û ji xwe pêve kesekî din nabînin û eger bibînin jî, wek kole an stûxwar û nûker dibînin, her wiha di dil û hinavên xwe de newêrek in, û ne mîrxas in, û guh nadin waneyên jînê, û pendên dîrokê ku hemû bi rûreşî dimrin yan, tîn kuştin, mînak(Mûsilînî, Pînoşê, Qezafî, Botefliq, Kaştro, Hîtler, Stalîn û Firanko) lê belê gel û welat wê her bimînin û ji berê de papîrên me gotine: Tu darên ku serê wan gihîşte ezmên tune ne!.



Nerîna Lîderan



“Kenneth McKenzie”:

“Amerîka bi sedema gefên Îranê, Îraqê bicih nahêle”.



“Mevlut Çavuşoglu”:

“ENKSê bi YPGê re lihevhatin kiriye, lewma ENKS di her cihekê de bo me armanceke rewya ye”.



“Hasen Rûhanî”:

“Me çavnhêrî ji çar welatên endamên hertimî yên “Şevra Emnîyet” nemaze du welatên Rûsiya û Çînê heye ku bi sedema berjewendiyekê ku di rêkvevtina Bercamê de heye li hember Amerîkayê bisekînin”.



Mihemed Cewad Zerîf:

“Bila Ewropa xwe netirsîne û gotinên di nav civînên taybet de eşkere bike”.

Çanda Kurdan li Mazinderanê û alîkarnebûna dewletê!



N: Eskender Ceiferî

Kurdên Mazinderanê ku di çend qonaxan de ji Kurdistanê ji bo wir hatine koçberkirin, hertim rastî hewlên asîmîlekirinê weke qirkirinên siyasî û çandî hatine. Herî dawî ew ji beşdarî di şeşemîn festîvala bîranîna Elîşah Xan Heyderîzade helbestvanê Kurd de bêpar bûn.

Di festîvalê de nivîskarên Kurd ji Hemedan, Loriştan, Ormiye, Sine, Kirmaşan û Îlamê beşdar bibûn.

Ev çêkirina astengiyan, bînpêkariya yasayên maf û azadiyan e ku li gor wan, her kes bêtî ku ji ber ziman, ol, baweriya siyasî yan jî yeke din jêbûna neteweyî û yan jî civakî, mal, zayîn an jî rewşeke din bibe, xwedî sîdwergirîna ji hemû maf û azadiyan.

Ew Kurd, piranî ji herêmên bakur û başûrê Kurdistanê Rojhilat in. Her ji dema deşthilata Mannayan ve di sedsala 9'an a beriya zayînê ve ew li Kurdistanê xwedî bandor bûn. Di dema çêbûna Împeratoriya Medan de rengê cudahiyan li navçeyê û dîsa jî tevlibûna hêzan derdikeve ku Kurdên Kurmanc û Goran jî ji wan hêzan in.

Dem derbas bû û deşthilat bû ya Şîeyan. Di salên derdora 1590'an a zayînê de hewla koçberkirina Kurdan ji Ormiye, Xoy, Makû û Selmasê ji bo Xurasan û Mazinderanê dihat dayîn. Ew di salên di navbera 1598'an de heya 1602'an yên zayînê ji bo Bakurê Xurasanê û Mazinderanê hatin koçberkirin da ku welatê Farsan biparêzin. Ew koçberkirin di encama

civînekê de hat ku di navbera Şah Ebbasê Sefewî û mezinên Kurdan re hate lidarxistin û serokhozên Kurd bi Sefewiyan re li ser koçberkirina wan lihev hatin. Beriya wê di şerê Çaldîranê de ku di sala 1514'an de çê bû, Kurdistan bibû du perçe. Di hemberî koçberiyê de hatibû misogergirin ku wê mafê wan li Xurasan û Mazinderanê paraştî be. Hevdem ligel wan, gelek Kurd jî, ji Kirmaşan û Îlama niha, ji bo wir hatibûn koçberkirin.

Ev cara yekemîn nîn e ku astengî li hemberî çalakiyên Kurdên Mazinderanê çê dibin. Beriya niha jî, wezareta Çanda Îslamî ya Îranê, rê nedabû festîvaleke Kurdên wê navçeyê bi hevrêzî ligel Kurdên Xurasanê bê lidarxuatîn. Festîvala Pîran Çengî ku her sal li bajarê Qûçanê li Bakurê Xurasanê birêve diçû û tê de hunermendên Kurd ên vê herêmê û bi taybetî kesatiyên naskirî yên muzîka kevn a vê herêmê beşdar dibûn, sala derbasbûyî pêşî lê hate girtin û îzna birêveçûnê jê re nehat dayîn. Ev di demekê de bû ku ji bo wê festîvalê ji aliyê Kurdên wê herêmê ve xerçeke zêde hatibû mezaxtin.

Ev kiryar jî hemû bîngehên Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan bînpê dike ku li gor wê, mafê çalakiyên welatiyan bîy liberçavgirtina sîstema dadwerî yan hokarên din yên weke qewmîyet, netewe, dîn yan bawerî, heye. Weke ku çawan Mihemed Neqî Lutfî nûnerê Elî Xaminêyî



li parêzgeha Îlamê ya Kurdistanê Rojhilat û pêşnimêjê bajêr dibêje, nabe zimanê Kurdî û nivîsa Kurdî li Îlamê hebe û divê pêşiya wê were girtin, li Xurasan û Mazinderanê jî heman rewş heye û herî dawî Mujgan Kawûsî nivîskara Kurd, ji ber parêvanîkirinê ji mafên Kurdan, ket girtîgehê. Herwisa cîgirê parêzgar di civînekê de ragihandibû ku dijberên Komara Îslamî dixwazin heşt nasyonalîstî angû heşt netewî di nav xelkê ve parêzgehê de çê bikin. Wî berpîrsê bilind e Îranî ji sazîyên ewlehî xwaştibû ji bo bêbandorkirina partiyên Kurdî li wir tevbigerin. Gotinên bi wî rengî hertim rastî nerazîbûna çalakvanan tîn lê di hember de cihê wan çalakvanan dibe girtîgeh.

Tevî ku rejîma faşîstên Tehranê benda yekem a Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan bi bîparkirina xelkê ji azadiyan ji wan standîye, benda duyem jî ku amaje dike ji ber statuya siyasî, hiqûqî an jî ya navneteweyî di navbera mirovan de cudayî nayê kirin û welatî li cem dewletan divê wehkev bin, bînpê dike.

Êdî çavên hemû Kurdên Mazinderanê wek Mujgan Kawûsî li Kurdistanê û li partiyên Kurd in ji ber ku ew dizanin rejîm, ji bo wan ti karekî encam nade.

Sûriya ji felaketekî ber bi felaketeke din



Sabri Rasoul

Piştî derbasbûna zêdetir ji neh salan ji qeyrana Sûriyê, hin jî karesat zêdetir dibe, û ti asoyek li esmanê Sûriyê xuya nabe ku wê qeyran û trajidiya welatîyên wê bidawî û çareser bibe.

Heta niha tişteke diyar nîne li ser nêzîkbûna bidawîhatina trajidiya Sûrî, yan rawestandina şer û kuştaran, nemaze ku şer bi awayekî gelemperî û giştî bi hêsanî bidawî nabin, heta ku hemû alî bi awayekî tevayî tevî şer nebin, bi awayekî ku heta niha ne ti însiyatîfên navdewletî yên aştxwaz serkevtine û herwiha jî, ne ti rêyên leşkerî serkevtine, tevî hin destkeftên leşkerî yên rejîmê bi alîkariya piştevanên wê yên herêmî û navdewletî.

Li Sûriyê kulb û bîrs, bûn ji berî hatina zagona “sîzer” bi awayekî berfireh hebû, jiber ku her tişt bikeve li pêşbaziya şeran de wê wêran bibe û şer wekî agir hemû hêvî û zeviyan dişewtîne, û gelek nimûne di dîrokê de hene ku qadên şeran bûne qadên kulb û birçîbûnê, û dermalên xwarin û çavkaniyên aborî dikevin di destê bazirganên şeran de, wek li hin navçeyên Afrîka û Asya yên di bin desthilatdariya Tirkiya de li serdema Osmaniyan ku qadên şer bûne qadên bîrsê, û niha heman bîrsîbûn li hin welatên dewlemend wek Îraq û Sûriya û Libnan û Sûdan dubare dibin.

Îro zagona “Sîzer” fersendek zêrîn e ji bo mafya û bazirganên şer, ji bo qaçaxiyê û derxiştina bi milyonan pere û dirav ji Sûriyayê ji tîrsa sizayên aborî, ku dîtir hemwelatîyên Sûriyê ti hêz û

qewet namînin li hemberî şerê nemanê, û niha ji qonaxa hejariyê dikeve di qonaxa birçîbûnê de, ku behayê “lîreya” sûrî bi yekcarî ket û dabezî li hember dolarê Amerîkî, û welatîyên sûrî ketine di gola bîrsê de û hêdî hêdî di bin bargiraniya hejariyê de dixenqin û niqom dibin.

Li aliyekî din yê vê trajidiyê, ku zêdetirî şeş milyon penaberên sûrî li derve dijîn, ku dîmenên “Sûriya ciwan” ji wan re bûne xwen û hizret, nemaze ji bona kalemê û pîrejinên sûrî li welatên rojavayî yên bi neçarî dev ji welat berdan, lê zarokên wan bi tenê navê Sûriyê ji çîrok û bîrhatinên dayîk û bavan dibihîzin; ku Sûriya bûye dîwarekî marjînal di bîr û hizrên wan de.

Esed berpirsiyarî vê trajidiyê ye, wî hemû hêzên radîkal û tundrew derbasî Sûriyê kirin ji bo ku çarenûs û mal û milk û jiyana gel bêxe di bin gef û tîrsê de, ji bo rejîma xwe rizgar bike, bi piştevaniya Spaha terorîst ya Pasdarên Îranê û milîsên Hîzbollah yên terorîst, tevî berpirsiyariya wî ya li ser redkirina hemû însiyatîfên dihatin pêşniyarkirin.

Welatparêzî, xêrxwazî kême bûye, çeteyatî, şerxwazî zêde bûye, dengê kesên durû û bêxîret bilind bûye li hemberî bêdengiya kesên zana û birûmet, û bi kurtî zimanê zîbrûzengê li ser zimanê siyasetê zal bûye, cudabûna di navbera aliyan de firehtir bûye, û îro piştî neh salên dijwar niha projeyên curbicur û berjewendiyên dewletên zilhêz dikevin rojevê, hin ji wan digel berjewendiyê gelê kurd û herêma kurdistana Sûriyê diguncin, wek berjewendiyên Amerîka û Fransa ku îro fişar û givaşan têxin li ser herdu aliyên kurdî (ENK-S û PYD) ji bo yekrêziya siyasî, rêveberî û leşkerî, hevdem ku diyaloga kurdî-kurdî bûye cihê nerazîbûna rejîmê û çeteyên opozisyonê yên li ser masa Tirkiyê gilişê dixwin, ku li şûna daxwazkirina pêkanîna dadperweriyê û dadgehkirina gunehbaran û pêşniyarkirina pirojeyêke siyasî li asta hez û daxwaziya hemû gelên Sûriyê ji



bo pêkvejiyanê û avakirina dewleteke federal, fire olî û netewî, berevajî daxuyaniyek bi îmzekirina 700 kesan derxiştin li dijî li lihevkirina Kurd-Kurd, bêtir ku rawestî li ser encamên şerê li Sûriyê yê di navbera hêzên navxweyî û herêmî û navdewletî de, ku yekser li dijî diyaloga kurdî daxuyaniyek şermezkirinê dan bi redkirin û dijayetiya gelê kurd û encamên diyaloga “texmînkirî”, di dema ku hin diyalog berdewam e û ti encam jî nehatine ragihandin.

Gelê kurd zêdetirî gelên Sûriyê yên din ducar û sêcar baca şerê Sûriyê daye, ji aliyekî ve baca şerê li dijî DAÎŞ û terorîstan û ji aliyekî din ve baca dagîrkirina Efrîn û Serêkaniyê û Girêspî ji aliyê artêşa Tirkiyê û çeteyên wê, ku bi hezaran welatîyên kurd birîndar û şehîd ketine û goristanên şehîdan li herêma kurdî şahidê vê karesatê ne, tevî ku heta niha jî ti danpêdan û danasîn bi maf û hebûna gelê kurd nahatiye dan, û bi tenê navê gelê kurd bi xirabî tê di xeber û daxuyaniyên dijayetiya yên serkirdeyên rejîmê û opozisyona îslamî de.

Wergeranda ji erebî: Ebdulaziz Qasim

Encumena “Keska Çiya” derheq gef û bêrêziyên welatfiroşan peyamek belav kir

Encumena jîngehparêzî ya “Keska Çiya” ya bajarê Merîwanê, di hember gef û bêrêzîkirina welatfiroş û kawilkerên jîngehê de, bo jîngehparêz û endamên wê encumenê, peyamek belav kir.

Di parek a wê peyamê de hatiye: “Gef û gotinên kirêt di hember endam û encumena me rawestînin, ji ber wê yekê ku, alxahîn bin hekî ew dubare bibe, êdî em di hember wê bêrêzî û bêhurmetiya ku derheq endam, şehîd û encumena me dikin, bê deng namînin”.

Deqa peyamê wiha ye:

Hogirên welat, jîngehparêzên welat, hogirên xwezaya paqij

ÄHer wekî hûn agehdarin, bi salane ku menca qirkirin, şewitandin û jinavbirina jîngeha wî welatî, ji aliyê kesên derfetçî, welatfiroş, talançî ve bi awayekî nemirovane raştî êrîşa dirnane û dûr ji hemû prensîbên exlaqiyî ve hatiye û ew bê xweparaştin ji her aliyekê ve bi hêceta wê yekê û bi xeyalên xwe ku endamên encumena “Keska Çiya” şevane deşt avêtine bi birîna baxçe û rapor dana wan deşt

bi reftarên kirêt û bêrêzî bi endamên encumena me kirine. bi gotineke Kurdî: “Diz hinde zîrek bû ku xwedîyê malê girt”.

Cihê mixabiniyê ye bo wî bajar û welatî ku 2 kes ji xortên xwe yên cangorî, canê xwe pêşkêşî berevanî ji jinavçûn û talana welatê xwe kirine, lê niha hejmareke talançî bona qazanca kesîn, bi wî awayî deşt bi qirkirina wê axê kirine û bi awayekî dûr ji axlaq, gefê bi hogirên welat û jîngehparêzan û endamên encumena “Keska Çiya” dixwen.

Lewma di wir de bi eşkere bo raya giştî radigehînin ku:

Birîn an derxistina darên baxçeyan an rapor û tîştên bi wî awayî, ti girêdayiyek bi encumena “Keska Çiya” û endamên wê encumenê re tinîne û endamên encumena “Keska Çiya”, çarçove û yasayên taybetî yên xwe hene û rewş û awayê karkirinê xwe bi 100`an car ceribandiyê. Ji hemû dilsozên wî av û axê daxwaz dikin ku, êdî derfetê nedin ku ew proseya qirkirin û bi talanbirin berdewam be û bona nivşên paşerojê dibe em hemû pêşiya welatfiroş û



talançiyên wî welat bigirin.

Careke din em dubare dikin, gef û gotinên kirêt di hember endam û encumena me rawestînin, ji ber wê yekê ku alxahîn bin ku hekî dubare bibe êdî di hember bêrêzî û bêhurmetî derheq endam, şehîd û encumena “Keska Çiya” bê deng namînin û em ê bihoşt bi bihoşt, dar bi dar, wan kunc û aliyên veşartî û zewtkarî yên jîngeh û daristanên welatê xwe bi belge, wêne, nav û cih, nîşanî xelk û raya giştî bidin û bi eşkere û em ê pêka rêkaran wan rezîl bikin.

Encumena “Keska Çiya”

25`ê Cozerdan a 2720 Kurdî

14`ê Hezîran a 2020`an

Xelkê 5 gundên bajarê Helîlan a Îlamê ava hewce tinînin

Berpîrsên rejîma Îranê di parêzgeha Îlamê de, ti karek bo terxankirina ava hewce bo 5 gundên Helîlanê nekirine.

Roja Înê, 12`ê Hezîranê, “Berpîrsê Av û Avero” yê parêzgeha Îlamê, “Nûrullah Têymûrî” bas kiriye ku pîrsgirêka tinebûna ava hewce bo wan gundên ku pîrsgirêka avê hene, piştî 4 mehên dinê û hekî xercê wê bê terxankirin dê çareser bikin.

Gundên “Gaw Dol, Midir a Olya, Piyaz Abad, Ban Likan û Guldere” yên bajarê “Helîlan” a girêdayê parêzgeha Îlamê pîrsgirêka tinebûna ava hewce bo jiyana xwe ya rojane hene.

Herwisa “Nûrullah Têymûrî” bas kiriye ku di wan çend rojên bê de, dê ser mijara pîrsgirêka tunebûna ava hewce bo wan gundan dê lêkolînekê bikin.

Rejîma Îranê bi piştguhavêtina pîrsgirêkên xelkê, û çaresernebûna pîrsgirêkên bingeîn yên xelkê Îranê, roj bi roj jiyana wan ya hejarane diwartir dike û rejîma Îranê bi cihê terxankirina bûdceya hewce bo wî xelkî, pereyê xelkê bona piştevanî û bihêzkirina girûpên terorîstî û birêvebirina siyasetên xwe yên çewt terxan dike.



Dengbêj Ebdulrehmanê Cizîrî: Bila payîzok neyên jibîrkirin

Ebdulrehmanê Mehmûdê Alê jî wek çend hunermendên Cizîra Botan niha di Qesra Mihemed Axa de li Cizîra Botan dengbêjiyê dike. Ew deng carna di kirasê xemû kûlên bê derman de li ber xwe dike; carna jî dibe bêhna keskesora buharê di gewriya dengbêj de

Dengbêj Ebdulrehman diyar kir ku wî heyranok, payîzok, bêhlûte, serêlî, sofî îbrahîm, lawîk, şeşbendî, narînik û bi dehan cureyên berhemên filklora Botan ji bavê xwe girtiye

Dengbêj Ebdurrehmanê Cizîrî wiha behsa xwe dike: “Ez Ebdurrehmanê Mehmûdê Alê li gundê Berêmirê di sala 1962 an de hatime dinê, gundê me gundê çiya ye, bavê min dengbêjekî bi nav û deng bû di welatê me de, herkes bavê min baş nas dike, xelkê gelek ji bavê min hez dikir, ez jî li ber destê bavê xwe dengbêjiyê hîn bûm, ango seyda yê min bavê min bi xwe bû.”

Deng û meqamê Ebdurrehman deng û meqamên çiyayê asê ne, ku di cîhanê de ev meqamên bêhempa û dirêj dişibe awazên Çermesoran

Dengbêj Ebdurrehmanê Cizîrî got: “Di dewrên berê de derfetên alav û gradên muzîkê nebûn li gundan li beran her tişt devkî bû, li serê çiyayên bilind du alî hebûn û peyma xwe bi devkî digihîştandin hevdu. Eevîn, keçik û kuran davêtana ber hev, qehremanî, bûyer û serboriyên civakê her qewmandinek hebûya dibû mijarên dengbêjiyê û îro ev berhemên me wisa hatine çêkirin.”

Cure kilamên Botan û Behdînan li ser diyalogên du aliyan hatine honandin, her tim di van kilaman de her du ali bang li hev dikin û di warê metaforên hunerî de jî her yek ji Îlyada û Odyseia-ya Homerosê kêmîtir nîne/

Dengbêj Ebdurrehmanê Cizîrî herwiha got: “Ez



dixwazim ku keç û xortên me baş bizanibin û dengbêjên nû jî derkevin, ez dixwazim ku payîzok neyên jibîrkirin, mixabin dengbêjên ku payîzokan dibêjin gelek kêmbûne; lê yên lawikan dibêjin baş e ku hîn mane: Cemalê Mihê Şirnexî lawikan dibêje; lê divê hejmara wan zêdetir bibe “

Ebdurrehmanê Mehmûdê Alê jî wek çend hunermendên Cizîra Botan niha di Qesra Mihemed Axa’de li Cizîra Botan dengbêjiyê dike, hema bêje her roj mêvan ji vê Qesrê kêmbûn. RÛDAW

Hunermendekî Kurd ji ber ştranekê bi nêzikî 4 salan hepsê hat cezakirin

Dadgeha Amedê ji ber ştraneke wî 3 sal û 9 meh cezayê zindanê li hunermend Azad Bedran birî û ew hunermendê Kurd jî dibêje, “ev ceza ne yê şexsê min tenê, yê hemû gelê Kurd e.”

Roja Pêncşemê, 8emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê, ji ber ştrana bi navê ‘Partîzan’, konsertên wî û herwiha postên li torên civakî, bi tohmata ku ‘propagandaya rêxistinê’ kiriye 3 sal û 9 meh cezayê zindanê li hunermendê Kurd Azad Bedran birî.

Azad Bedran li ser vê mijarê ji Rûdawê re ragihand, dema wan ştrana ‘Partîzan’ amade kir destûr ji Wezareta Çandê ya Tirkîyê xwest û wezarete jî bandrol da û diyar kir, “Destpêkê pirsgirêk tune bû, paşê rojeva Tirkîyê guherî û ji ber wê yekê ceza dan. Lê

ev ceza ne ya şexsê min tenê ya hemû gelê Kurd e, ji ber ku dixwazin çand û hunera Kurdî qir bikin. Naxwazên zimanê Kurdî pêş bikeve.”

Li ser ştrana ‘Partîzan’ jî Azad Bedran amaje bi wê dike ku ew ştrana Hozan Dilgeş e ku 25 sal berê nivîsandiye û dibêje, “Min jî bi awayekî nûjen xwend. Li ser Youtubê jî bi milyon hat temaşekirin, Lê Youtubê ji ber giliyên Tirkîyê ew ştrana rakir. Ez di wê ştranê de propagandayê nakim, encamek heye li holê û me çavê xwe bi wê ştranê vekir, gelek ji me jî bi wan ştranan zimanê xwe nas kir, çanda xwe nas kir. Min jî xwest nîfşên nû jî xwe bi vê ştranê nas bikin.”

Azad Bedran dibêje, ev yekem doza wî ye û diyar dike, “Lê niha gelek hunermendên Kurd, wek Hozan



Canê, niha di zindanan de ne, ji ber ku ştranên Kurdî gotine. Lê ev ne yekem doz e û ne dawî ye. Ev şerekî sedsalî ye. Weke ştranbêjekî Kurd ez dê dîsa ştranên xwe bêjim.”

Herwiha ew hunermendê Kurd dibêje, parêzerên wî di aliyê hiqûqî de li ser dosyê disekinin ku ew ceza li dadgeha bilind bê betalkirin.

Dadgeha Îstînafê 3 sal berê ew cezayê ku berê li Azad Bedran hatibû birîn betal kiribû, lêbelê Dadgeha Amedê careke din ew hunermendê Kurd ji ber ştranên wî ceza kir. RÛDAW

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Husên Ehmedîniyaz: Şerê derûnî yên navendên ewlehî û dadseraya Înqilabê, dijî exlaqê mirovahiyê ne

“Husên Ehmedîniyaz, Mafnas û Parêzerê pêle yek ê dadgusterî li civînekê digel Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê, li derheq dawî rewşa “Hidayet Ebdullahpûr” ê hepsiyê siyayî yê Kurd li girtîgeha Urmîyê, şerê psîkolojîkî ya navendên ewlî yên rejîma Îranê şermezar kir.

Ehmedîniyaz, ragihand: “Zêdetir ji mekhekê ye ku Hidayet Ebdullahpûr girtiyê siyayî yê Kurd bo cihekî nexuya hetîye veguhasîn. Sê roj beriya niha dadserayê Şinoyê bi bavê Hidayet Ebdullahpûr re ragihandibû ku serdana Birêveberiya Tawanan a Dadgeha Înqilab a bajarê Urmîyê bike. Du roj beriya niha bavê Hidayet piştî serdana wê navendê, li deştêkê bi wî re radigehînin ku me ti zaniyariyek li derheq wî de tine. Lê îro Çarşemî, 21`ê Cozerdana 1399`an, serdana Birêveberiya Tawanan a Dadgeha Înqilab a bajarê Urmîyê dike û ew bi bê şermane radigehînin ku hikmê Hidayet Ebdullahpûr 20 roj beriya niha li birêveberiya tawanên dadseraya înqilab a bajarê Şinoyê de hatiye cîbicîkirin.

Herwisa navbirî dibêje: “Givaşên psîkolojîkî yên navnedên ewlehî û dadseraya Înqilab li ser malbata Hidayetpûr neyasayî ye û dijî hemû pêwerên mirovî û exlaqî ye.”

Ehmedîniyaz ragihandiye: “Hevkarên rêzdar ên min; Parêzer Maziyar Tatayî û Parêzer Osman Muzeyen bi berdewamî li pey wê mijarê ketine, lê hata dadsera nûçeyeke rast jî nedaye parêzeran, ew reftaranane digel ti yek ji yasa û pêwerên maf cih nagre.”

Roja Şemî 20`ê Banemer, Hidayet Ebdullahpûr, hepsiyê siyayî ê bi îdamê hatî cezadan, li girtîgeha Urmîyê bo cihekî nexuya hatibû veguhasîn, û dadgusterê Urmîyê û navendên ewlehî li dana her core bersiveke rohn li derheq wî hepsiyê siyayî xwe diparêzin.

“Hidayet Ebdullahpûr”, hepsiyê siyasî yê ku bi îdamê hatî cezadan, xelkê bajarê Şinoyê ye û rêketa 13`ê Gelawêj a sala 1395`an, hate binçavkirin.

Hacer Seîdî bo benda “Jinan” a girtîgeha Navendî ya bajarê Sineyê hate veguhasîn

Roja Çarşemî, 28`ê Cozerdanê, çalakvana mafê jinan, “Hacer Seîdî”, bo benda “Neswan” a girtîgeha Navendî ya bajarê Sineyê hate veguhasîn.

Ew çalakvana mafê jinan, di Dehemîn roja binçavkirinê de bû, ku bo benda “Neswan” a girtîgeha Navendî ya bajarê Sineyê hate veguhasîn.

Ew çalakvana mafê jinan di heyamê binçavkirinê de, ji mafê hebûna parêzer û dîtina malbata xwe bêpar bûye. Roja Yekşemî, 18`ê Cozerdanê, karbideştên Wezareta Îtîlaatê, bê hebûna belgeya yasayî, êrîşî ser mala wê çalakvana jinan kirin û herwisa bê hebûna belgeya yasayî ev binçav kirin.

Heya niha ti zanînek ji hegera binçavkirina “Hacer Seîdî”, ji ber deşt nîne.

Ew Çalakvana mafê jinan, berê û di nêzî roja cîhanî ya kedkaran de, ji aliyê îdareya Îtîlaata Sineyê ve, hatibû banghêjkirinê û lêpêçîn digel wê hatibû kirin.

Suheyla Hicab di girtîgeha Qerçekê de deşt avêtiye girêva birçîbûnê

Roja Sêşemî, 27`ê Cozerdanê, hepsiya siyasî ya bajarê Kirmaşanê, “Suheyla Hicab”, di benda qerentîne ya girtîgeha Qerçek a Weramînê de, li hember rewşa aloza xwe û givaşa ser malbata wê, bi nîşaneya nerizayetiye deşt avêtiye girêva birçîbûnê.

Herwisa wê hepsiya siyasî ya Kurd, bi nîşana nerizayeti û piştevanî ji nerohniya qeder û ragirtina hepsiyeka dinê ya Kurd, “Zeyneb Celaliyan”, di girtîgeha Qerçek a Weramînê de, deşt avêtiye bi girêva birçîbûnê.

Suhêla Hicab, roja Çarşemî, 28`ê Reşeme ya sala 1398`an, ji aliyê taya 28 a dadgeha înqilab bi serokatîya dadwer “Mihemed Muqîyse”, di bajarê Tehranê de, “Suheyla hicab” bi hindêk tohmetên wekî: “Banghêjî dijî hikûmetê, kombûn û hevkarî, têkdana raya giştî bi armanca fitnesazkirinê, avakirina girûpên neyasayî bi armanca mafê jinan û daxwaza rêfrandom û guherîna yasaya bingeîn”, hatibû cezadanê û di gelemperê de 18 sal heps li ser de sepandibû.

Berê jî, “Suheyla Hicab” bi belavkirina “Dilnivîsek”(Dilnivîştê)ê nivîsandibû: “Ya ku bi serê min û Kurdên dinê di Îranê de tê, rojekê dê ku ezê bo mêrg û deryayan bêjim, heya bi hurde keviran peykerekê saz bikin û serbazan jî wê di nav pirtûkên dîrokî de bîne malên xwe, di hember zulm û zorê de hekî agir ji bedena min bilind bibe, ti car serî naçemînim, hekî heya bilindahiya esman ji bejn û balayê min jî nizimtir bibe.

Berê jî, roja Sêşemî, 30`ê Banemerê, bi banghêjiyekê, daxwaz ji wê çalakvana medenî hatibû kirinê ku di roja Sêşemî, 3`ê Cozerdanê, xwe bi dadgeha pêdeçûnê ya bajarê Tehranê re bide nasandin û piştî ku xwe dabû nasandin, ew parêzera Kurd, ji aliyê karbideştên îtîla`ata Spaha Pasdaran ve, hatibû binçavkirin.

Di Holendê de terorîstekî êrîş kire ser endamekî PDKI


Roja Înê 30'ê Cozerdan, di welatê Holendê de bi kêrê êrîş kirine ser “Sadiq Zerza” û di encamê de hate birîndarkirin, navbirî berê endamê rêberiya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê bûye.

Li gor rapora rojnameyekî Hulendî, ew endamê PDKÎ, bi lêdana zêdir ji 15 derbên kêrê hate birîndarkirin û hegera hindê heye ku ew êrîşe “palnera siyasî” bûbe.

Hawdem malpera navenda Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê bi belavkirina wî nûçeyê, ragihand: “Kesek bi navê R.P xelkê bajarê Şinoyê ku wisa hatiye zanîn bo xwendin û devreya pisporî ya pizîşkî li welatê Holendê bûye, peywendî bi “Sadiq Zerza” re digre û daxweza dîtîne û rênivîniyan lê dike. “Sadiq Zerza” ku diçe bo cihê dîtîne û bi deste gulekê diçe cem wî, kesekê îşare pê kiriye bi kêrê êrîş dike ser wî û çend kêran li sîng û laşê Sadiq dide.

Malpera “Kurdistanmedia”yê di berdewamiya vê nûçeyê de ragihandîye ku kesê êrîşber ji aliyê polisê welatê Holendê ve hate binçavkirin.

“Sadiq Zerza” berê endamê rêberiya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê bû û navbirî xelkê bajarê Şinoyê û niha jî rûniştîyê welatê Holendê ye.



Lihevkirina aliyên Kurdî li Rojava

Piştî dagîrkirina herdu bajarên Girêspî û Serêkaniyê ji hêla artêş Tirkîyê ya dagîrker û çeteyên wê ve li nîva meha Cotmeha 2019'an, yekser ji aliyê General Mezlûm Ebdî fermandarê giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) ve, însyatîfek ji bo yekrêziya kurdî li rojavayê kurdîstanê hate pêşniyarkirin, û li gorî “Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirov” ya mafnas Ramî Ebdulrehman, li roja 29-ê nîsana 2020'an, yekemîn gera diyaloga kurdî-kurdî bi serpirştîya balyozê Amerîkî li Qamişlo dest pê kir, û li roja 16-ê Hezîrana 2020'î, piştî cend civînên hevbeş, herdu aliyên Kurdên Sûriyê bi amadebûna nûnerê Amerîka li rojavayê kurdîstanê “William Roebuck” û General Mezlûm Ebdî Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokrat HSD, qonaxa yekê ya lihevhatina yekîtiya kurdî bi daxuyaneke hevbeş bi herdu zimanên Erebi û Kurdî di preskonfiransekê de li bajarê Hesekê ragihandin. Di daxuyaniya hevbeş de tevî spasiya rola serok Mes'ûd Barzanî û serokê Herêma kurdîstanê Nêçîrvan Barzanî û General Mezlûm Ebdî û nûnerê Amerîkayê “William Roebuck”, hat ku herdu aliyên kurdî “pêvajoya destpêkê ji diyaloga kurdî bidawî kirin û bi hev re gihiştin nêrînek siyasî ya hevbeş û lihevkerinê pêşîn ku bendên (Rêvebirin, Hevbeşî, Ewlehî û Parastin) yê Peymana Duhokê 2014-an bikin bingeha berdewamkirina danûstandinan û diyalogên di navbera herdu aliyan de, wê peymanek giştî di pêşeroja nêz de îmze bikin. “Daxuyaniya hevbeş hat bêtî diyarkirina hûrgiliyên din yan diyarkirina xalên lihevkerinê û zanyarên zêdetir, hevdem ku Peymana Duhokê di mijdara 2014 'an di navbera ENKS û

PYD bi însyatîfa serok Mes'ûd Barzanî li Duhokê hatibû îmzekirin, ji encama êrîşa hovane ya rêxiştina çeteyên DAIŞ ya terorîst li ser devera Kobanê, lê mixabin piştî rizgarkirina Kobanê ev peymana giring nehat cîbicîkirin û bi tenê ma xamav li ser kaxezê.

Piştî borîna çend salan dubare Peymana Duhokê ji aliyê siyasî û leşkerî û îdarî ve giringiyek mezin heye, nemaze ji aliyê siyasî ve, ku tê de îmze li ser fedraliyê ji bo Kurdistanê Sûriyê wek daxwazek netewî ya kurdî hatiye kirin, û herwiha ku Kurdistanê Sûriyê ji Efrînê heta Dêrikê yek herêma cugrafî û netewî ye.

Piştî bidawîhatina erkê nûnerê Amerîkî “William V. Roebuck” wê civînê hevbeş bi



dûvçûn û sponseriya şandeke Amerîkî di navbera herdu aliyên kurdî berdewam bin, herwiha bi piştgiriya serokatîya Herêma kurdîstanê û çend dewletên rojavayî di nav de Fransa, Brîtanîya û Almanîya, û ji aliyê balyozxana Amerîkayê li Şamê, di daxuyaniyekê de bi zimanê kurdî bi germî pêşwazî li lihevkerina pêşîn ya kurdî hate kirin, û bi “pêngaveke girîng ya dîrokî ber bi lihevkerineke mezintir” binav û pêşwazî kir, di daxuyaniya balyozxana Amerîkayê de hat ku “Ev lihevki-

rin sembola yekem pêngavek girîng ya kordînasiyoneke siyasî ya mezintir di navbera kurdên Sûriyê de bi piştgiriya Amerîkayê, herwiha dê bibe alîkar ji bo çareseriyê aştiyane ji aloziya Sûriyê di bin biryara 2254 ya NY de ...”.

Hesekê: “Bajar û navenda rêvebirina parêzgeha Hesekê ye û piştî Qamişlo, mezintirîn bajarê Rojavayê kurdîstanê ye, û navê Hesekê yan jî “Hisiçe” ji navê Hesoyê Êzîdî şivanê Îbrahîm Paşayê Millî ve hatiye”.
Rapor: Agirî